



Nameya Roja Cîhanî ya Şanoyê 2018 – Welatên Erebi

Maya Zbib, Libanan

**Derhênera şanogerî, şanoger, nivîskar, damezirênera hevpişk ya
Dezgeha Zuqaq ya Şanoyê**

Ev dema hevbaweriyê ye, dema nevegerandina/dûrkirina nakokiyên e da ku tu carî di tu çalakiyên sivîl ên din de peyda nebe. Ev karekî sivik û hêsan e ku hin kesan xwestin li heman cihê û di heman demê de li hev bicivin ji bo cihê xwe di ezmûneke hevpişk de bigirin. Ev bangeke ji merovan re da ku, li şûna karên tekane di komeleyan de xwe birêxistin bikin ji bo ramanan ji hev re veguhêzin, û şêweyên hevpişkiyê di standina biryaran derbarê karên pêwîst de bi awayekî berpirsiyar, bikar bînin ... û hêdîhêdî, hevpeywendiyên xwe yê merovane ava bikin, û tiştên hevbeş bêhtir ji nakokî û cîyawaziyên, bi hev re berçav bikin. Ev yek cih digire dema çîrokeke taybet re û şivîlan seranserî gerdûnê dişopîne. Herwiha, girîngî û xurtiya şanogeriya di rîya şanokariyê re tê xuyakirin.

Di çanda tirsê ji çavsoriya kesên din, jihevduxistin û tenahiyê de seranserî cîhanê, û hevalbendî li vir û di dema niha de karekî jihevhezkerinê ye. Standina biryara sêdewergirtinê ji demê, dûrî xweşadkirina rasterast û berjewendiyên kesane yê berbad û xweverestina di civaka me de ku, bi lezgîniyê pêş ve diçe. Ev pêşdeçûna hêdîhêdî û karkêmkirinê karekî siyasî ye, û ber bi ezeziyê ve dajo.

Piştî hilweşandina ramanweriyên mezin, û di dema ku têkçûna pergala navneteweyî ya nû ji dehsalan ve zelal dibe, em dê çawa siberoja xwe ji nû ve berbiçav bînin? Gelo, di dema ku ewlehî û xweşî di giftûgoyan de tiştên pêşek û sereke ne, emê karibin bi danûstandinên ne xweş

berdewam bikin? Emê karibin di herêmên metirsîdar re derbas bibin bêyî ku em tu destkeftiyên xwe jidest nedin?

Îro roj, lezgîniya gihandina têgehan ji zanîne pêwîstir e, diruşim ji gotinan nirxbilindtir in û wêneyên kelaşan ji gewdên merovan birûmetir in. Ji ber vê yekê, şanogerî hatiye da ku bi bîra me bîne ku em ji goşt û xwîne çêbûne, û laşên me giran in. Hebûna şanogeriye ne tenê hestên me hişyar dike, lê me bi wê rastiye jî agahdar dike ku dîtin tenê ne besî wergirtina têgehan e. Şano heye da ku wate û hêzdariya bêjeyan vegehe, û mafê axaftinê ji dest siyasetvanan bigire û dîsa têxe cihê dirust. Ango, raman û guftûgo di meydana nerînen hevbeş de bibine xwedî kartêkirin.

Di riya xurtiya nîgaş û çirokgotinê re, şanogerî hem şeweyene nuh li pêşiya me vedike ji bo wergirtina têgihîştinên cîhanî û hevaskirinê, hem jî asoyeke nû ji bo têkilheviyê geştiyane hemberî binpêkirina lêborîne ji me re vedike. Dema piştî salên zehmetkêşiyê û melyonên merovan seranserî gerdûne bûne qurbanî da ku wan nepejirînin û şermezar bikin, tirs ji biyaniye, axaftinê bi kî û bawermendiya rajoriya spiyan bi awayekî hêsan vedigerin ser masê... Dema qîz û lawên sîpe yan tene gulebarankirin, yan jî tene zîndankirin bi sedema baweriyên xwe yê dijî setemkarî û zordariye... Dema kesên bêhiş û kotekên rastgîr li hin welatên sereke ji cîhana yekem, dibine desthilatdar... Dema cenga gerdîleyî (niwewî) weke lîstikeke asayî di navbera mezinan û zarokan de, tene xuyakirin... Dema liv û tevger bêhtir tene astengkirin ta radeyê nizim, û dema penaber hewl didin ku bigihine wan bircên di xewnên xapîner de avakî, tevî ku dîwarên bilind di pêşiya wan de tene avakirin; lê mixabin, ew di deryan de binav dibin û dimirin... Em dê li kû li cîhana xwe bipirsin dema ku bêhtirê ragihandinê hatiye firotin? Ji bilî dilovaniya li ser şanogehê, em dê karibin dîsa bi pergala merovahiye û şeweyê cîhana nû biramin? Bi giştî, bi hezkirinê, dilsoziye û rexnekirina avaker di riya raman û danûstandinên xurt û nerm re tene bikaranîn.

Weku meroveke ji welatên Erbî, ez dişem (karim) dijiwariyên li pêşiya hunermendan derdikevin, zelal bikim. Lê, ez yek ji nifşê bi şanogeriye ve têkildar im, û em kêfxweş û bextewar in ku ew dîwarên hewcedarî rûxandinê naskirî ne. Vê yekê riya guhertina tiştên berdestbar û

pêşvebirina hevkarî û nûjenkirinê ji me re vekir, da ku em karibin li ser banan, di odeyeyan de, û di zikak û kolanan de jî bînerên şanoyê li bajaran, li gundan û di penagehên penaberiyê de perwerde bikin. Berî niha, me karîbû di naveroka şanoyên xwe de hertiştî ji piç û parçeyan avabikin, û her û her şêweyên nû ji bo xwevedanê ji çavdêriyê bafirînin, da ku xwe ji sînorên sor û berbendên berferah (taboyan) biparêzin. Îro roj, şanoker seranserî cîhanê di riwê wan dîwaran de radiwestin. Ji ber vê jî, bidestxistin kêma nebûne û çakirina (serastkirina) siyasî şûna wan çavdêran girtiye.

Herwiha, komela navnetewî ya şanogeriya dibe xwedî kartêkirineke civakî, û îro roj bi roleke mezintir radibe da ku wan dîwaran, çî bîna û çî nebîna bişikîne. Îro ji her demê bêhtir, pêdivî bi jinûve avakirina binetarên pak û wêrek yê civakî û siyasî heye. Ji bo serastkirina kêmasiyên xwe, û bicihkirina berpirsiyariya xwe hemberî cîhanê, em bi karekî hevbeş radibin.

Weku şanoker di cîhanê de, em ne peyrewên tu ramanweriyan in, ne jî peyayên pergaleke tekbawerî ne. Lê, bi giştî, em her û her li rastiya, bi hemû reng û şêweyên xwe ve, vedikolin. Vepirsîna me ya herdemî ji bo peydakirina sîbereke durist e, dijberiya me herdem bi sîstemên setemkar re ye, û di dawî de, lê ne ev bi tenha, armanca me xwegiriya merovahî ye.

Em pir in, em qet natirsin û em hene û emê bimînin.

Wergêr ji Îngilîzî : Gurgîn Îsa (Dilovanê Deştê)

KOMA ŞANO/ QAMIŞLO